

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat pîrozbahî gote serokê Herêma Kurdistanê

»»» R:3



Şandeke Partiya Demokrat serdana Komeleya Komunîst a Îranê kir

»»» R:2

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (351) 06-06-2019 Buha (1000) Tûmen

Şabûna gel, şîna rejîmekê

»»» R:2



Dîktator dilerize!



nine. Her di vê çarçoweyê de jî bû ku Xamineyî bas ji “Muqawimet”ê kir, jiber ku li ser vê baweriyê bû ku bi vî rengî, Komara Îslamî digihîje xala “serîtewandina bi dijmin”, lewra ragehand ku ew (Amerîka) dixwaze di biyavê leşkerî de, me bide sekinandin, lê nikare, hekî em “muqawimet”ê bikin (li ber xwe bidin).

Pêştir jî Xamineyî di roja 8-ê Cozerdanê de derheq pirograma navkî û mûşekî ya rejîmê ghotibû: “Eva pirseke namûsî ye, û em li ser pirsên namûsî tu gotûbêjekê nakin”.

Ew “muqawimet” a ku Xamineyî basê dike, û bedel (xerc û têçû) a wê, renga ji bo wî û taqma serşor a wî tişteke wisa nebe, û bandoreke wisa li ser jiyana wî û malbata wî nedanê, lê raştiya wê, ew e ku bûye sedema herifîna biyavên aborî, exlaqî, siyasî û ferhengî a welatekî bi navê Îranê.

Pêştir “Mike Pompeo” 12 merc bona gotûbêja digel Tehranê danîbûn, ku yek ji wan xalan pêk dihate ji sekinandina bernameya mûşekî a vê rejîmê, ku berdewam ji aliyê rayedarên rejîma Îranê ve hatiye retkirin. Hevdem “Mike Pompeo” di dawî lêdwana xwe de got: “Digel vê de ku “Pişka herî zêde ya zext û givaşan” berdewam dibin, lê em amade ne, ku bi bêy pêşmerc jî gotûbêjê digel Tehranê bikin”. Di hember de Komara Îslamî ragehand: “Dibe Amerîkayî reftara xwe li hemberî Îranê biguherin!”.

Ji aliyekî din ve “Trump” di dawî sefera xwe de ku bo Birîtanyayê hebû, tevî “Theresa Mary May” di konferanseke çapemeniyê de ragehand ku Amerîka îznê nade Tehranê, ku bibin xwediyê çeka navkî, û eva wekî hêla sor diyarî kir, pîrsek ku serokwzîra Birîtanyayê jî pêdagirî li ser kir. Herweha “Trump” di hevdîtineke televîzyonî de digel kanala “ITV” ragehand: “Herçend ku ez naxwazim bi Îranê re bikevim şer, lê hemû demekê egera şerekî leşkerî heye, lewra hez dikim ku bi gotûbêjê em kêşeyan çareser bikin”.

Xamineyî herweha di nimêja cejnê de, ku roja 15-ê Cozerdanê berevajiyê welatên din ên Îslamî rojekê derengtir bi rê ve çû, tevî bi îxanetkar hesibandina Behreyn û Erebiştanê, di beşeke din ya axavtin xwe de got: “Reşnivîsa aştiyê ya naskirî bi “danûstandina sedsalê” (Deal of the Century) pilaneke îxanetkarane ya Amerîkayê ye, ku Erebiştan û Behrêyn jê re rêxweşker bûn”.

Rojên 25 û 26-ê Hezîranê biryar e ku civîneke navneteweyî di Behreynê de bi rê ve here, ku tê de reşnivîsa dewleta “Trump” derheq pêşvebirina aştiya di navbera dewleta Feleştîn û dewleta Îsraîlê de wê behs li ser bê kirin, û dawiyê bi zêdetir ji 70 salî rikeberî û kêşeyên di navbera Îsraîl û Feleştînê de bîne.

Ew şewaza derbirîne ya Xamineyî di salvegera mirina Xomêynî de, vê raştiyê nîşan dide ku: “Tirsa diktator ji çareserbûna kêşeyên herêmê û kurtbûna zêdetir ya destên tevdanîkarane yên Tehranê û di dawiyê de jî rêgirîkirin e ji cilîdanêya Tehranê li ser sînorên Îsraîl û herêmê bi awayekî giştî”.

Lêpirsyarê giştî ê PDKÎ bi helkefta cejna Remezanê peyameke pîrozbahiyê belav kir

Lêpirsyarê giştî ê PDKÎ di peyamekê de, bi helkefta hatina cejna Remezanê, pîrozbahî li mislimanên cihanê û neteweya Kurd kir.

Peyam wiha ye;

Cejna Remezanê li we pîroz be.

Bi helkefta hatina cejna pîroz a Remezanê, pîrozbahiyên germ ên xwe pêşkêşî hemû mislimanên cihanê û neteweya Kurd, bi taybet gelê Kurd li Kurdiştana Rojhilat dikim.

Di van rojan de, rêzgirtin ji malbatên serbilind ên şehîdan û ew malbatên ku ezîzên wan ên xebatkar di pêxema azadiya Kurdiştanê û gelê Kurd ê bindest de di girtûgehên rejîmê de ne, ji hemû gavan zêdetir berçav dibin. Ez silav û pîrobahiyên taybet li wan ezîzan dikim. Em li bendê ne ku, xelkê xebatkar û niştimanperwer ê Kurdiştanê jî, emegnasiya xwe derheq van malbatan û girtiyên siyasî, zêdetir ji berê bînin ziman.

Herwisa heşt bi hevxemî û hevpiştewaniyê bikin û li gor derfetê, heştên xwe nîşan bidin.

Hemû rojên jiyana we tijî xweşî bin.

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê

Lêpirsyarê giştî

Miştefa Hicrî

13`ê Cozerdana 1398`an

3`ê Hezîrana 2019`an

Elî Xamineyî di 30-yemîn salvegera mirina dîktatorê sedsalê, di 14-ê Cozerdana îsal, li ser gora navbirî derheq dawî rewşa Îranê û dawî helwestên Amerîkayê axivî, û tevî hişdarîdana bi berpîrsên rejîma xwe, gef xwarin ku nabe Amerîkayî nêzî me bibin.

Navbirî ragehand: “Dijmin hinek caran gefan dixwe, û hin caran jî bi timayîbirina me bi hin tiştan, dixwaze ku me bixapîne, ew yek hewlek e bona xapandina me, lewra dibe ku em hişyar bin”.

Xamineyî di beşeke din a axavtina xwe de, ku di raştî de naweroka qisên wî, û peyama sereke ya vê axavtinê bû, rû li beşdarên merasimê got: “Ya ku niha hewce ye li ser me, û dibe ku bihê kirin, tenê “Muqawimet” e! Herçend ku têçû (xerc û bedel) a wê zor e, lê dibe ku em piştî xwe pê qahîm bikin”.

Di çend hefteyên borî de û hevdem digel zêdetirbûna şerê zargerî ê di navbera Îran û Amerîkayê de, pîrsa gotûbêja du welatan jî hate rojevê, û di vê navberê de “Trump” di sefera xwe ya ji bo Japonê basê vê kir, ku siyaseta Waşingtonê li hember Îranê “guherîna rejîmê”

Sergotar

Şabûna gel, şîna
rejîmekê

N: Kerîm Perwîzî

Roja 14-ê Cozerdana 1368-an sibezi bû ku em ber bi xwendîgehê ve diçûn, û wê demê dema ezmûnên dawîya salê bû, ku digotnê “îmtihanên meha Cozerdanê”. Di riya xwendîgehê de, me guh li dengê bilîngoya Husênîyeyê nêzî xwendîgehê xwe bû ku hawar dikir û tazîdarî pêve xûya bû. Her di wê demê de bû ku şîna û taziya sertaserî jî ragehand û xwendîgeh û îdare jî hatin daxistin!. Em çend heval jî ku em diçûne ser îmtihan (ezmûn)ên xwe, di xweşîyan de, me nedizanî ku em çi bikin!. Di dema veşerîyanê de çavên min lê bû ku hemû kesên ser kolan û şeqaman pê dikenîyan! Eva hikayeta wê rejîmê ye di nava dilê civakê û li ser şeqaman! Bilîngoya û tirîbonên hikûmetê şîna û taziya wan bû, lê xelkê ser kolan û şeqaman jî pê dikenîyan. Belê ew roj, roja mergê Xomêynî bû!

Ew rejîma Îslamî ya Tehranê tenê di roja mergê celladê Cemaranê de nebû, ku heşt û sozên wê li dijî gel û civakê bûn. Hikayeta dijîgelîbûna wê rejîmê gellek kûr e, û ji xwendîgehê ve bigre heya siyasîyê, û ji îdareyê ve bigre heya mizgeftê, rejîm û gelên Îranê du eniyên bi tewahî cuda ne, û li hember hevdu de çeper girtine.

Hekî rejîm piropagandeyê bo piropagandeyê televîzyonî dike, xelk jî piropagandeyê din hez dikin. Hekî xelk li seyrana û geştên parkan hez dikin, rejîm li wan qedexeyê dike.

Ew melayê mizgeftê ku rejîmê daniye, xelk htûçûna wan mizgeftan nakin! Ew melayê ku xelkî ye jî, û gel rîz û hurmetê jê digrin, rejîm

Şandeke Partiya Demokrat serdana Komeleya Komonîst a Îranê kir

Şandeke Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, serdana Partiya Komonîsta Îranê kir.

Roja Yekşemî 12'ê Cozerdana 1398'an, şandeke Partiya Demokrat, bi serpereştîya Miştefa Hicrî, Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, serdana Partiya Komonîsta Îranê kir, ku ji aliyê Seyîd Îbrahîm Elîzade, berprisê yekem û hejmareke li endamên rêberatiya wê partiyê pêşwazî ji van hate kirin.

Di wê civînê de, Îbrahîm Elîzade, bîr û ramanên xwe derheq rewşa siyasî a Îran û tevgera azadîxwaz a gelên Îran û xebat û têkoşîna hemû tex û qadên Îranê, bi taybet piştî Beframbara 1396'an, û karta baykutên siyasî û aborî yê Amerîka û Hevalbendan li dijî sîstema aboriya rejîmê nîşan da.

Herwisa navbirî got: Em derheq guherînakiriyêke binge-hîn û derbazbûn li siyasîyê rejîma Îranê, tenê rîçara me girîngî pêdan bi xebata cemawerî û tevgerên cemawerî û herwisa amadebûna xwe bo alîkarîkirin li asta seranserê Kurdiştanê nîşan da.

Piştî Miştefa Hicrî, tevî



îşarekirin bi veşartîbûna bandora baykutên Amerîkayê, lidîyê rewşa aloz ya siyasî û aboriya Îranê bas ji wê kir: Rêberên rejîmê tu rêçareyek bo van nemaye xeynî teslîmbûn û xwe çemandin li hemberî siyasîyê dijî mirovî yê rejîmê de, got: Hatina komên xelkê li meydana bo rizgarbûn ji bindestê wê rejîma kevnepereset e.

Lêpirsyarê giştî yê Hizbê, herwisa îşare bi wê yekê kir ku, hewl û hêza hizbê bo xebata lidîyê rejîm, alîkar û bihevî xebatkirina gel û

aliyên siyasî yê Îranê kir û got: Tev aliyên siyasî daxwaz dikim da ku, alîkariya me bidin li ser bingeha xalên hevpar hûrtir bin û bo hemû erkeke di piroseyên siyasî de, rola xwe bilîzin û nîşan bidin ku, gelê Kurd û tevgera rewa ya wê di wê piroseyê de, bandordar e.

Di dawiyê de jî, herdu aliyên, li ser bihevî karkirin û alîkarîdan û hevahengîkirina digel yektir, bi armanca poçkirina pîlanên rejîmê û hewlên terorîstî yê wê rejîmê tekez kirin.

wan melayan ji karê wan dûr dixê!

Rejîm dixwaze ku xelk di merasîmên şîna û taziyê ên hikûmetê de xembar û tazîdar bin, lê ciwan bo xweşderbazkirin û xweşîyê û dîtina hevdu diçing wan merasîman!.

Îsal jî şahî û xweşîya xelkê digel dijberiya rejîmê berbirû bûye. Ne tenê her şahî û xweşîya di xwendîgehê û li parkan de, belku ragehandina roja cejna wan jî, digel xelkê nine.

Îsal roja 14-ê Cozerdanê, rejîm wekî hemû salên din, mijûlî birêvebirina şîna û taziyê bi boneya merge celladê Cemaranê ye, û hevdem roja cejna Remezanê jî ketiye wê rojê de.

Dijberiya şahî û şîna xelkê û rejîmê, îsal gihîştê lûtkeya xwe. Her çend ku rejîm dixwaze roja cejnê bixwe roja paştir, da ku wekî hertim cejna xelkê digel cejna welatên derdorê nebe, û hem destêwerdanê di nava şabûn û kêfxweşîya xelkê de bike, û hem jî xelkê vexwîne bo şîna û tazîdariyê, lê xelkê roja “şîna”a rejîmê kirin roja “şabûn”a xwe.

Xelk hem bi boneya cejnê û hem jî bi boneya salvegera mirina Xomêynî e cellad, şad û kêfxweş in. Xomêyniyê tawanbar ew celladê ku di jiyana xwe de bi hezaran kesî kuşt, yan dane kuştin, bi mirina wî bi milyonan xelkê kêfxweş bûn.

Herçend ku mergê Xomêynî dawîya rejîma tawanbar ya Tehranê nebû, û celladeke din cihê wî girt, lê bi mirina Xomêynî dilê bi milyonan xelkê daxbar e destê rejîmê hêsayî û aram bû, û ew celladê ku cihê wî girt, li ser heman rêbaza bednaw ya wî ye, û êdî tu tevnek nemaye ku piştî mirina xwezayî ya kuştina wî celladî bi destên xelkê, bikare rejîmê pêkve girê bide.

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat pîrozbahî gote serokê Herêma Kurdiştanê

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, di peyamekê de pîroba-hiyên Partiya Demokrat gi-handine Nêçîrvan Barzanî ku wekî, serokê Herêma Kurdiştana Îraqê hate hilbijartin.


Deqa peyamê bi wî rengî ye:

Rêzdar Nêçîrvan Barzanî

Silavek germ

Di demeke wiha de ku, xebata gelê Kurd di hemû parçên din bo bideştveanîna mafê rewya yên xwe li qonax-

eke gellek heştîyar derbaz dibe, hilbijartina cenabê te ji aliyê parlemanê wekî, serokê Herêma Kurdiştanê, û pê spartina erkeke giran, lê, em li ser vê baweriyê ku, bi mifah vergirtin li van ezmûnên xuya ku di heyama salên serokatiya Encûmena Wezîrê Hikûmeta Herêma Kurdiştanê bi deştveanîne û hizrkirin bi vê berprisayetiya girîn û dîrokî ku dikeve ser milê ve, di raştî hereketa gelê Kurd bigiştî, hemû hêz û şiyana xwe bi kar tînin.



Em bi vê hilbijartina bicî ya palemana Herêma Kurdiştanê keyfxweşin û her bi vê boneyê jî, ji aliyê xwe û hemû rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, bi dil ji ve pîroz dikim û hêviya me serkevîna ve ye.

digel rêz û hormeta dubare



Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

8`ê Cozerdana 1398`an
29`ê Gulana 2019`an

Şandeke PDKÎ di 44.mîn salroja avakirina Yekîtiya Nîştimanî de beşdarî kir



Şandeke PDKÎ, bi boneya 44.mîn salroja avakirina Yekîtiya Nîştimanî, serdana Malbenda bajarê Koyê, ya Yekîtiya Nîştimanî kir.

Roja Sêşeme 11`ê Cozerdana 1398`an, şandeke PDKÎ, bi serpereştiya "Mihemednezîf Qadirî", cêhgirê duyem ê Lêpirsyarê giştî û berpîrsê

Dezgeha Pêwendiyên giştî yê PDKÎ, serdana Malbenda bajarê Koyê ya Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdiştanê kir, û ji aliyê heyeteke Melbendê, bi serpereştiya "Burhan Se`îd Sofî" berpîrsê Malbendê pêşwazî ji wan hat kirin.

Di vê hevdîtîne de, Şanda Partiya Demokrat, pîrozbahi-

yên PDKÎ, bi boneya 44.mîn salroja avabûna Yekîtiya Nîştimanî pêşkêşî Mekteba Siyasî, Serkirdayetî, kadir û endamên Yekîtiyê kirin.

Li hemberî vê jî, heyeta Yekîtiya Nîştimanî, tevî spaskirina ji PDKÎ re, pêwendiyên duştîyê yên di navbera herdu aliyan de bilind nîrxandin.

Dezgeha Hilbijartin a PDKÎ semînarek lidar xist



Dezgeha Hilbijartin a PDKÎ bi alîkariya Dezgeha Rêkxistinê semînarek bo berpris û endamên komîteyên hizbê yên li Herêma Kurdiştanê, lidar xist.

Roja Şemî, 4`ê Cozerdana 1398`an (25`ê Gulana 2019`an), semînarek bo berpîrs û beşek li endamên komîteyên PDKÎ li Herêma Kurdiştanê, derheq pîrsên hilbijartinên di nav PDKÎ de birêve bir.

Seminar bi ragirtina bîstek bêdengî bo rêzgirtin li riha pak ya şehîdên Kurdiştanê deştê kir.

Pîştîre, Dara Natiq, berpîrsê rêkxistinê eşkere ya PDKÎ derheq armanca lidarxistinê ve civînê û herwisa girîngîbûna civînê û semînarê bi wî rengî yê derheq pîrsên cuda ku yek ji van rikeberiya di navbera Îranê û Amerîkayê li deverê de bo amadebûyan axavt, û navbirî bas ji erkên endamên PDKÎ ku wekî stûneke serekî ya Hizb ne, bo xweamadekirinê û çavaniya xweparastina van li hemberî her core bûyerê û herwisa guherînkariyên ku di vê rikeberiyê de rû didin kir.

Pîştîre Selîm Zencîrî, berpîrsê Dezgeha Hilbijartinê baseke giştî derheq hilbijartinê û girîngiya vê pîrsê û rola derheq çarenivîsê û jiyana siyasî ya hizbê pêşkêş kir, û herwisa eşkere jî kir ku, ev demeke dirêj e ku vê mijarê di PDKÎ de cihê xwe peyda kiriye û tê bicîkirin. Her-

wisa demokrasî û hilbijartin, bîngê girîng in ku ev partî li gor wan hatiye avakirin.

Herwisa Zencîrî îşare bi guherînkariyên piştî derbazbûna kongireya 16`an kir ku li pêhateya Partiya Demokrat û avakirina dezgeha taybet bi vê pîrsê kir û ragihand û derheq girîngbûnê û hewcebûna avakirina vê dezgehê wiha axavt û got, ev yek nîşana nîrxdana zêdetir ya rêberatiya hizbê bo pîrose û herwisa bersiveke gellek bicî ye bo van dengdanên ku bas ji bînxirkin yan vîdedana pîroseya hilbijartinan ji aliyê Partiya Demokrat ve tînin encam dan.

Berpîrsê Dezgeha Hilbijartinê herwisa ragihand ku: Em hewl didin da ku mîkanîzmeke taybet bo pîroseya hilbijartinê di çarçoveya ştratiya nû ya Hizba Demokrat de amade bikin û piştîre



ji aliyê Navenda Siyasî ve bê erêkirin, û bilez deşt bi encamê danê ve pîroseya di Rêkxistinê eşkere ya hizbê de bike, da ku, ev hilbijartinan bibine rîkeberiyek bo xizmetkirina zêdetir û vesîleyek bo gihîştin bi kesên lêhatî bo cihê lêhatî.

Ji aliyê din ve, Ebas Ehmêdî, endamê dezgeha Hilbijartinê bo nûneratiya ve dezgehê axavtinek derheq hewcehiya elektronîkkirina karê rêkxistinê kir û di vê derheqê de zêdetir bo amadebûyan şîrove kir.

Herwisa dawîya semînarê bo tîbînî, nerîn û pîrsên amadebûyan hatibû deştînan kirin.

Di zîndana Diyarbekirê de “xweşuştin!”



N: Bûbê Eser

Helbet maf û heqê her mirovekî/ê ye ku xwe bişo. Şuştin mirovan paqij, canê me re temîz û wecê mirov jî xweş dike. Lê hezar mixabin ku di zîndana Diyarbekirê de ev heqê girtiyan tune bû. Tenê heqeqî wan hebû ku ew kesên nû dianîn zîndanê bi ava gû didan şuştin ku di deşpêkê de wan kesan çavtirsîyayî bikin. Hûn ya rastî bixwazin, ew kesên di wê zîndanê de mane, bi hezaran pirtûkan jî li ser wan binivîsnin de tu caran nikaribin wê zîndanê bidin zanîn.

Ji berku di wê zîndanê de tiştên dibû û diqewimî, li vê cîhanê li tu welatan neqewimîye û nehatiye serê welatîyên wan. Ji ber ku tirkan tim Kurd dijminê xwe dîtine û bi vê jî tim ji wan tirsîyane. Ji ber ku wan welatê me dagir kirine. Ji bona li ser erda me kêfa xwe bikin, me bikin xulamên xwe çî ji wan hatiye kirine û dikin. Ji ber vê ew tim xwe bi xwe dibêjin û digotin: “Heger rojekê Kurd azad bibin, wê me tirkan bikujin û wê tovên me li vê dinê nehelên. Tiştên me anî ye serê wan û tînin serê wan, bêhempa ne. Heger azad bibin wê ji vê xerabtir bîne serê me”.

Belê tirk her weha difikirîn, loma jî tim ji Kurdan bitirs bûn. Ji ber vê tirsê tim xew li wan diherimî. Lewra jî li gor bawerî û dîtina tirkan, ji bona Kurd azad nebin divê wan her li me Kurdan bidana, em bikuştina û welatê me wêran bikirina û dikin.

Deşdirêjî û zilma li me Kurdan dikirin, ji ber tirs û xofa xwe bû. Lê weke tê zanîn ku li vê cîhanê rojekê azadî tê û

dagirker têk diharin. Wê ew roja me Kurdan jî helbet bê.

Gardiyan dibêje:

“Ez û ew hevalên ku bi min re hatibûn girtîgehê em êdî li wir bûbûn gardiyan. Bîr û baweriyên me, dîtîna û nerînên me, heta ez dikarim bêjim însanetiya me jî bûbûn bi awayekî din. Dema ez wan bûyerên ku me dikirin yeko yek bêjim, tê jî bi xwe bibîne ku em çawan ji însanetiye dûr ketibûn.

Ew kesên ku dihatin girtin, berî ku bêne girtîgehê, wan îşkence û lêdan ji deştê polîsan didîtin û demekê jî di binçavan de diman. Weke diyar e ku ew mirovên gelek îşkence didîtin û birîn li canê wan çêdibûn, ji bo başbûn û rehetbûna birînên wan, ew li cihê binçav de dihiştin ku birînên wan baş bibe. Ew mirovê ku lêdan û dema binçavîyê diqedandin, ji aliyê dadgehê ve dihatin girtin û dişandin wê girtîgeha ku ez lê bûbûm gardiyan.

Kesên ku dihatin girtîhegê, berê di bin hemû metodên îşkanceyan de dihatin derbaskirin. Qasî mehekê an du mehan di hucreyan de diman. Dûre ji aliyê me ve, bi biryara me ew di qawîşekê de bi cih dibûn. Me metodeke weha bi kar dianî ku kesên bixwaştina zû herin qawîşekê, pêwîst bû wî yan jî wan, ew şert û şirûtên me û ew biryarên ku me ji bona hucran danîbûn, pêk bianîna. Ji ber ku di wir de herkes fêr dibûn ku dawîya serîhildan û berxwedanê di hucran û di girtîgehê de tune. Loma gelek ji wan zû, biryarên me pêk dianîn, sirûdên leşkerî zû jiberdikirin. Tiştên me digot, pêk dianîn.

Ew kesên nuh dihatin girtîgehê, rewş û şertên girtîhegê nedizanî bûn. Wan bawer nedikirin ku bûyerên weha dûrî aqilan, wê li wir bêne serên wan. Ew kesên, dema xwe ya îşkencê û ya binçavan diqedandin, leşkeran ew dibirin dadgehê û li wir yên ku dihatin girtin, ji bona me



dişandin. Dema ew diketin hundir, em yek gardiyan nêzikî wî an wan dibûn û me digot:

-Hoo, hevvelatîyê min tu bi xêr û xweşî hatî vir. Wey wey wey!.. hela bala xwe bidinê, wan polîsên bê bext, hevvelatîyê min kiriye çî halî! Wax, wax, wax xuya ye ku te ji mêj ve serê xwe jî neşuştîye. Wax li min, hawar li min, kuro ma ev karê mirovantiyê ye. De bisekine ez berê te bibim hemamê ku tu serê xwe bişo, xwe paqîş bike. Dûre têr nan bixwe û here qawîşa ku tu dixwazî, de ka kincên xwe ji xwe bike!

Girtiyên reben nizanîbûn ku wê çî bihata serê wan. Loma wan ji wê axaftina me ya ku me tinazê xwe bi wan dikir, bawer dikirin. An dixwaştin bawer bikin, ji ber vê yekê bû ku kêfa wan dihat û difikirîn ku piştî îşkence û lêdanê, wê seruştin ne xerab be. Bi wan bîr û baweriyên weha, wan di xem û xeyala seruştinê û têr nanxwarinê de, hema zû bi zû deşt bi ji xwekirina kincên dikirin ku bi zûtirîn wextê de xwe bighînin pariyek nan û xwarinê. Loma ji bilî derpê, hemû kincên xwe derdixist û digot:

-Ez hazir im!
Me li halê wî û li gotara ku “ez hazirim” dinerî, em dimizimîzîn. Weke gurê ku nêçîra xwe girtibe, kêfa me dihat û bi awayekî fenok em bi dora wî diketin. Kesên nuh dihatin, wan wê çawa biza-

nîbana ku divê mirov derpiyê xwe jî ji xwe bike. Loma jî wan derpê ji xwe nedikirin, heta ku me yekî bi tinazî bigota:

-Hevvelatîyê min! Divê tu derpiyê xwe jî ji xwe bikî (derpiyê xwe jî derxî), weha xuya ye ku te zûde serê xwe neşuştîye. Ji bo tu baş bê şuştin, divê tu tiştê li ber te nemîne, ji xwe ew kincên li ber te nepaqij in. Em ê yên nuh, temîz û xweştir bidin te.

Piştî axaftinên me yên weha girtî tédigihîşt ku rewş ne baş e. Qederekê xwe bi vir û wir de dibir û dianîn ku derpê ji xwe nekin, lê xilasbûna wan tune bû. Dema wan xwe vardiqiland, an jî nedixwaştin derpiyên xwe derînin, me yekî bi hêrs digot:

-Derpê jî derxin! ma hîn hûn bo çî sekinî ne!
Ew tédigihîştin ku êdî tu çare tune, loma derpiyê xwe jî ji xwe dikirin, xwe rût û tazî dikirin. Dûre em yek diçûn ba wan, berê li salonê digeland ku sama wan bê şikandin. Piştî me ew kes dibirin ser wê hucra ku tije gû (pisîti) bû. Çî jin, çî mêr yê ku têteta deştê me, diketin wî halî. Me ew li ser hucra tije gû, didan sekinandin û digot:

-Xwe bavê!
Ew weke tenegehîştîbin ku em ji wan re dibêjin; “Xwe bavê nava wî gûyî de”. Loma berê li dora xwe mezê diki-

Takekes û civaka Rojhilata Kurdistanê ji sêkuncika agireke çandî ve



N: Hadî Ezîzî

Em wekî mirov di nava derûneke cuda ji xwebûna xwe, û cuda ji civaka xwe de winda dibin, û di pişt mask û erka civakî em têne naştin. Ew rewş wekî “xerîbbûn” tê pênasekirin û li gora şiroveyeke felsefeya civakî di navbera hebûn yan nebûnê de mirov berhev- dan û şiroveyê jê re dike. Digel pêşketina teknolo- jiyê û gihîştina dest û baskê mirov bi gellek zanyariyan, hinek diyalog û hevpeyvîn di navbera mirovan de pêk hatin, ku di cîhana networkê de van qise û basan cem- serên erdê jî pêkve girê dan, carna li rex van axavtinan de ku bas ji teknolojî û za- nişt û mirovahî û pêşkevîtinê tê kirin, derfetek jî bona bas li ser neteweyan heye û renge mirov hewce bike ku carna bi dana mînakên wekî ceribandînan bas ji welatê xwe û neteweya xwe bike. Di vir de pirs ew e ku gelo mirovê Kurd dikare xwe wekî dewlet yan welat pênase bike? Gelo ew şeweyên diyalogê li hemû beşên Kurdistanê wekî hev in? gelo ew mirovên Kurd ku karîne xwe ji bazineya hizra dagîrkariyê rizgar bike û ... hwd?

Ew nivîsa jêr bi dût ji etnîk- gerayî û perçegerayîyê rewşa mirovê Kurd li Rojhilata Kurdistanê dide berhev, û alozî û sergerdanî a civaka

Rojhilata Kurdistanê li ser bingeha ziman û kultur ku mohra siyasî ne, bo pênaseya neteweyekê vedirewîne.


Komelnasî (sociology) û mirovnasî (anthropology) wekî du liqên girîng di za- niştên mirovahiyê de ku bûne du bazineyên lihevali- yayî ku civaknasiyê bi xwe bi ser mirovnasiyê de zal kiriye, bersiva gellek pirsan dide, û di vê lêkolînê de bi piştqahîmiya van zanîstan sê zaraweyan emê şirove bikin ku wekî sê çeçên cencerekê dikare takekes û civaka Kurdî bihare.

Ew zarawe (deştewaje) di heman demê de ku ji hev cuda ne, di heman demê de jî tewawkerê hevdu ne, û pêk tîn ji:

- 1-Alienation
- 2-Assimilation
- 3-Integration

1-Alienation: Piraniya herî zêde ya bîrmendên cîhanê niha mezintirîn kêşeya ci- vakî, wekî kirîza hebûnê yan jî xwenenasînê şirove dikin, piraniya wan filso- fan bas ji “Alienation”ê kirine, û her yek ji wan bi awayekî li ser axivî ne ji wan, Hêgil, Marks, Foêrbax, Êrîk Firom, û ... hwd. Di nav a hemû lêkdaneweyan de rewş giştî ye. Ew jî bas ji nebûna vînê, û “stress” û xwedorandinê û dûrketin ji derûna xwe dikin. Herweha di nava nivîsandînan û azadiya ramanê ya filsofan, zaraw- eya “êgzîstaniyalîzmê”ê (bawerherbûna bi xwe ye, û şaş e ku wekî pûçgerî bihête şirovekirin, ku di vir de cihê basa me nine) jî ew rewşa li ber çav hatiye girtin, û weha tê şirovekirin.

nava gû, me hîn bêtir deşt bi lêdanê dikir ku ew xwe ji ber darên me bidin alî, dema wan xwe bi virde û bi wir de dikirin, herderê wan di nava gû de dima. Him lê- daneke baş dixwarin, him di nava gû de dihatin gerandin, dûre me ew ji vir derdixiştin, li ser betonê dirêj dikirin û bi dar û jopan bi canê wan



Ew dibêjin: Emên mirov di derûneke cuda ji xwebûna xwe û cuda ji civaka xwe de winda dibin û li pişt maska civakî têne naştin. Ew rewşa wekî “xerîbbûn” tê pênaseki- rin, û bi şiroveyeke felsefeya civakî di navbera hebûn û nebûnê de mirov lêk dide. Li vir de mirov, nebûnê di hebûnê de dibîne. Ew yek jî mirov ji kûrahiya derûna xwe dût dixwe, lewra mirov tûşî ji xwe bîhanîbûnê dibe. Rojhilata Kurdistanê ku niha di rewşeke gellek xirab ya aborî de dijî, ew yek jî berî her tiştî van derfetan ji mirov diştine ku bi xwe re bigihîje, aliyê kêmkare cardin pêdeçûnekê bike bi ser mêjî, derûn, û fêrbûnên xwe de. Herweha bindestiya dagîker û çavtirsandîkirina civakê ji aliyê Komara Îslamî ve bûye sedem, ku mirovê Kurd cuda ji vê ku di Rojhi- lata Kurdistanê karê wê li tu kesî neketiye, heta ji xwe jî veqetiyayî ye.

Hemû civakek her deh salan carekê pêdeçûneke dîrokî

diketin. Jop radida wan, dar li mêranî ya wan dixişt, yanî tiştê ku dûtî aqil, me dianî serê wan, ku ew di rojên ewilî de çavtirsîyayî bibin, ev pilan gişt yê yuzbaşiyê me bûn. Lê me ji daxwazên wî bêtir lêdan li wan kesên girtî dikirin. Heta me dereke wan neda şikandin, dev ji wan bernedida. Ev yeka bûbû

û siyasî bi xwe de dike, bi lêkdaneweya aştî pêşkevîna civakê û hatina nişkeke nû bo nav bazineya civakê, ser ji nû darêjeyê jê re dadirêjin, û bi mîkanîzmên curbicur dinirxînin ku di nav civaka bindest a Rojhilata Kurd- îstanê ew rewş roj bi roj xiraptir dibe û bi ser xelk û civakê de dişkê, û mirovê Kurd zêdetir di nava siyas- etên çepel û gemar ên Ko- mara Îslamî û neteweya serdest de nuqim dibe. Rewşa xirab ya civakê ew huner jî ji takê Kurd standîye ku dibe xwendin bona fêrbûn û za- niştê be, lê ew dixwîne heya ku bikare wekî karmend di nava sîstema hikûmetê de cihê xwe veke heya ku di siberojê de ji birçiya nemire, ku wisa bû ber bi vê arasteyê ve diçe ku hikûmet jê re di- yarî dike û eva jî wan miro- van han dide ku ne tenê ji derûna xwe belku ji her tiştî veqete. Ew mirovê dudil di piraniya vebijêrkan de heya

»»»»Doma R:6

»»»» Doma R: 4

rin, weke bide diyarkirin ku “em ê xwe bavêjin kîderê” hina ji wan dixwestin fena bikin. Lê me ew fenê wan bêyî ku pirs xwe dubare bikin, hema bi yek carê, me her yekî, bi wan darên (kalas) ku di deştê me de bûn, li wan dida û ew davêtin nava wî gûyî de. Dema ku ew diketin

weke biryarakê me gardi- yanan, ji bona wan kesên nuh dihatin girtîgehê.

Me navê vê metoda ku me dianî serê wan kesên nuh dihatin girtîgehê, kirîbû “bixêrhatin”. Bi vî awayî me xêrhatin dida wan û li halê wan dipirsî(!).

»»»Dom R:5

di asta hezkirin û pekanîna malbatê wekî bingeha civakê bihêz nine. Lewra ew encam lê dikeve ku dawî car bi cudabûn û têkçûna malbatê bi dawî tê. Ku niha Rojhilata Kurdistanê ji vê haletê pirr e û ew yek jî her hemû berhema siyasetên Komara Îslamî ye. Ew ji xwe bîhanîbûn ku têgihîştin di gel de nine, rewşekê pêk tîne, ku wekî çiroka bajarê Gulanê her hemû jî çep-çep li hevdu dinêrin û kes ji vê rewşa heyî razî nine û hevdem jî tu kes xwe gunehbar nizane. Koma vê têgihîştinê me berbirûyê mirovekî dike ku ew bixwe nine û xwe li pişt maskekê veşartîye, û ew maskdarbûn e ku bi derbazbûna zeman kesayetî dayê, û civakekê diafirîne ku cuda ji bindestî û dagîrkarî hatiye herackirin.

2-Asîmilasiyon (Assimilation): Bi wateya giştî yanî wekîhevbûn, şibhî hevdu, yan avakirina wek hevdu. Ew zaraweya zêdetir di warê kulturî û ferhengî de bi kar tê û di zaniştê de bo civakekê yan neteweyekê tê bikaranîn ku bi awayê giştî di nava bindestîya taqmek yan neteweyek yan hikûmeteke hakim de dihele û ji kultur û çanda xwe vediqete ku ew mijar di Rojhilata Kurdistanê de, ziman jî wekî bingeha kultur hevaltiya wê dike û em dikarin bi vî rengî zelaltir navê wê bînin ku Komara Îslamî dixwaze Rojhilata Kurdistanê raştî asîmilasyona zimanî û kulturî dike.

Ziman wekî diyarkerê erdnîgariya siyasî û bingehîna a kulturê, mezintirîn pênase ye bo netewebûnê. Herçend ku her ji herifîna Madan ve her paşayek ku hatiye ser kar hewl daye ku Kurd ji her tiştî bêpar be, îca heta di çewtekariyên dîrokî û ...hwd.

Serdema paşatiya bi nav Pehlewî bi navê reforman komeke yasayên civakî û siyasî bi ser neteweyên cuda ji neteweya Fars de sepanê. Ku neteweya Kurd zêdetir raştî vê arasteyê dibû. Ji van mînakên afirandina zimanê

Farsî a Kirmaşanî bû ku heya niha jî û piştî hatina ser kar a rejîma Xomênî ew rewş bi sedema vê ku mirovê Kurd di warê ayînzayan de di nava demûdezgehên leşkerî de berdewam dike û bi taybetî di nava Kirmaşanê de tewaw cihê şewaza Kelhurî vala hiştiye. Ew qas ku hikûmeta Îranê ji riya leşkerî de hewl daye ku Kirmaşanê wek herêmeke farsnişîn nîşan bide. Ew qas jî aliyê Kurdî li hember de berpirsyar e ku wek xesarnasiya siyasî em dikarin bêjin şoreş û serhildan di Rojhilata kurîstanê de bi taybetî di heştîyên zayînî de nekariye ku di navçeya Navderwen li Kamyaranê û şeweya xeraca wan li Rewanserê ber bi xwartir heye, lewra morkên neteweyî jî raştî kalbûneke bêwêne bûn, ku zêdetir rê dihate xweşkirin bo sîstema dagîrker heya ku siyaseta xwe ber bi pêşve bibe. Di Rojhilata Kurdistanê de bi awayekî giştî rewşeke heye ku hemû civak bi xwe ve mijûl kiriye û take Kurd bi guman ve li Kurdbûna xwe dinêre.

Sîstema zal weha kiriye ku mirovê Kurd ji derbazbûyîya xwe veqete, û ew asta heya vî cihî pêş ketiye, ku di piraniya malên Kurd de wênayên derevîn ên paşayên Hexamenîşî (Exmîni) tê danîn û Kurd jî wekî Fars rojane hindê hevokên nerast ên paşayên Hexamenîşî di torên civakî de deşt bi deşt dikin. Ji aliyekî din ve ziman ku di her civakekê de qedexa bû roj bi roj bazineya zimanewanî û wateya peyvan ji resenbûna xwe dûr dikeve û her zimanek jî ku rojane bi awayekî zaniştî kar li ser nehatiba kirin, berew nemanê ve diçe û di nava kolan û bazara neteweyeke bindest qise û wêjeya neteweya serdest û hakim têkelaw dibe. Helbet di vir de mijarê girîng heye ku hewcehî baskirinê ye, ew jî taqmek ji Rojhilata Kurdistanê ne, ku bi sedema serqalbûn di nav demûdezgehên hikûmetê de û zalbûna bi ser navenda bajarên Rojhilata Kurdistanê bi awayekî wekî bazirganeke xirab kultura neteweya serdest û navenda hikûmetê ve

tînin bo nav bajarên Kurdistanê ku her bajarek komeke gundan li dewra xwe kom kirine û ew taqî bi navê ferhengîbûnê ve tewaw digel merama hikûmetê xwe rêk dixin û rewşenbîr jî di çarçoveya wan rojnameyan de çalak in ku Komara Îslamî ya Îranê wan çap dike di encam de sîstema hikûmetî de bi belavkirina vê hizrê ku zimanên we ziman nine û şewezarek e ji zimanê farsî, kesê Kurd berew aliyekî ve dibe ku xwe di hember kultura neteweya serdest sivik dizane û heya wir dice pêş ku di cihên giştî de digel zarokê xwe bi farsî qise dike û dema jî ku digel farsekê berewrû dibe, bi şanazî dizane ku bikare wek farsekî baxive, û bi awayekî dikeve nava pêşbazîyê de digel neteweya serdest û di gellek ciyan de bi şermezariyê dizane ku xwe wekî Kurd bi nav bike.

3-Entegrasiyon: Entegrasiyon pêk tê ji deştepeyvekê ku bo civakekê tê bikaranîn ku himbêza wê vekiriye bo koçber û penaberan ku rû bikin wir. Ew kesê ku rû dike wê civakê, komek erkên giran dikevin ser milan, bona jiyana wê ya rojane pare nemîne. Dibe xwe digel wê civakê raşt bike, û berî her tiştî dibe fêrî ziman û kultura vê erdnîgariyê be ku dixwaze tê de bijî.

Ji van mînakên berçav koça van dawiyane ya xelkê Rojhilata Navîn û bi taybetî Kurdistanê bû, ku niha hemû di kempeynan de akincî ne da ku fêrî ziman û şewaza reftara van welatan bin. Di asta Rojhilata Kurdistanê de bi van bajar û metropolên Fars û Tirk tê gotin ku Kurd bi şewazên cur bi cur ber bi wir koçber bûn, û niha jî li wir akincî ne. Di vir de cihê xwe ye ku em li ser valahiya berevajî ya vê rewşê jî bisekinin ku ew jî heki heta duh bajar û civaka Tirk û Fars di çarçoveya entegrasiyonê de Kurdên koçber wekî xwe perwere dikir, lê îrorojê civaka Rojhilata Kurdistanê li doma siyasetên Komara Îslamî û neteweya serdest, di asta asîmilasiyona pêşketî, erk û wezîfeya harîna kesê Kurd

girtiye stûyê xwe, û bi awayê sîstematîk pêş dikeve.

Di nava civaka dervey Kurdistanê de jî mirovê Kurd di encama reftara civakî û berewpêşveçûna jiyana xwe dema ku dikeve nav piroseya zewacê û pêkanîna jiyaneke baştir êdî bi yekcarî dihele, û ew yek jî dawî qonaxa devberdana ji netewe ye û bi jidayîkbûna yekem zaroka xwe, dibe ku bo hertim xatrê xwe ji netewe û nîştimana Kurdî bikin. Dawî gotina wan malbatên koçber jî ew e ku dê û bavê min Kurd in lê ez fars im. Aliyê xirab e vê rewşê ew e ku civaka Kurdî bixwe dibe entegrasiyon. Heta malbata Kurdî raştî vê herifînê jî tê ku gotina piyaw yan jin di malbatê de ji heşt û hezkirinê têngahîje, û nikare di biyavê aramiyê de yê din bilorîne. Lewra jî eva baştirîn hêcet e bona bizarkirin ketina pey neteweya serdest, ku rojane bi ragehandin û sînema û piropagendeya kulturî zêdetir vê rewşê û zemînê xweştir dike heta ku neteweyên din pê rakêşe, ku di vir de aliyê neteweyî lê berpirsyar e ku nekariye baweriya Kurdatiyê bide tak û civakê.

Di dawîya vê basê de em dikarin bi paradaymekê ku di bin çavdêriya kesên pispor û neteweyî de be, takekes û civaka Kurdî ji vê rewşê rizgar bikin. Ew paradaym dikare bi çavdêriya hûr û zaniştîyane ya di biyavê pîrensîpên neteweyî de, çavdêriya hemû mijarên nav acivakê bike ku her ji alfabêya deşt-pêkî ya xwendîgehê ve, heya nivîsên li ser tabloyên dikan û bazaar û ragehandin û sînemayê bi xwe ve digre. Her weha dibe ku aliyekî pispor bihê avakirin ku bikare bi dûr jîher cure îdeolojî û rikeberîyeke hizbî, ji bo netewe û nîştiman alîkar be, ku ew paradayma yekem dibe deshilateke siyasî-aborî li piştê be, duyem eva ku dibe "Encumena Asayîşa Neteweyî a Kurdistanê" bê avakirin, ku bikare di navbera deshilata siyasî-aborî û paradaymê, aliyê berjewendiya tak û civaka Kurdî bê paraştin.

Nerîna Lîderan



Donald Trump:

“Rejîma Îranê Hikûmeteke bê desthilat e”.



Melik Selman:

“Çalakiyên rejîma Îranê, gefeke li ser ewlehiya dever û cîhanê”.



Alî Xaminyê:

“Em li ser karûbarên namûsî yên Şoreş a Îsalmî rêkvevtinê nakin”.



Benjamin Netanyahu:

“Rejîma Îranê salane dehan milyon Dolarî xercê Hizbullaha Lubnanê dîke”.

Amerîkayê bi sebeba binpêkirina baykutan welatîyekî Îranê û kompaniyeye Tirkîyê tawanbar da naskirin

Wezareta dadweriyê ya Amerîkayê di daxuyaniyekê de bas ji vê kiriye ku, kesê bi navê Peyman Emîrî Larîcanî ku berê rûniştîyê bajarê Îstembola Tirkîyê bû, bi tawana binpêkirina baykutên Amerîkayê yên lidjî rejîma Îranê sikala tomar kiriye.

Xeynî wî welatîyê Îranê, kompaniyayeye Tirkîyê jî, ya bi navê “Kral Hewaçîlik” bi sebeba darêtina pîlanan bo kirîna alavên balafirên ku Amerîka çê dîke û veguhasîna van bo rejîma Îranê hatine tawanbar kirin.

Di vê daxuyaniyê de îşar bi vê hatiye kirin ku, ev kirîn û veguhasîna bi bê agehdariya kompaniya û dewleta Amerîkayê hatine encam dan, û ev alavane bo kompaniya û rêkxistina karê esmanî bo Îranê hatine hinardekirin.

Li gorî gotina wezareta Dadweriyê ya Amerîkayê, Peyman Emîrî Larîcanî û kompaniya “Kral Hewaçîlik” hewl dane, yasa û metrsiyên li ser Amerîkayê yên derheq baykutan û bazirganîkirina



digel rejîma Îran û herwisa yasayên warê hinardekirinê binpê kirine.

Herwisa di beşeke din a vê sikalyayê de hatiye ku: Tawanbaran bo bihêzkerina kompaniya balafirên ya [TT1] “Mahan Air”, ku piştêvan û girêdayî Sapha Pasdarana terorîste, yek ji amorên serekî yên rejîmê di kriyaranê destêverdan û afirandina aloziyane.

Li gorî gotina yek ji berpirisên wezareta navxwe ya

“Mahan Air” yek ji gefên li dijî Amerîka û Hevalbendan tê hesab kirin.

Xeynî kompaniya “Mahan Air” di daxuyaniya Wezareta Dadweriyê ya Amerîkayê de, çend kompaniyayên din yên balafirên yên wekî “Sehend Air û Kîş Air” jî îşare pê hatiye kirin.

Di beşeke din ya vê daxuyaniyê de, hatiye ku bi sebeba reftarên rejîma Îranê, yên derheq nearamiya deverê, di cîbicîkirina baykutan li dijî vê rejîmê berdeyam dibin.

Spaha Pasdarana terorîst endamgîrî dîke

Spaha Pasdarana terorîst di daxuyaniyekê de, daxwaz ji ciwanan kiriye da ku tevî refên vê saziya terorîstî bin.

Piştî ku Amerîkayê di daxuyaniyeye fermî de ku, saziya Spaha Pasdarana rejîma Îranê xîste nav rêzbenda girûpên terorîstî de, endam û ailgêrên vê saziyê jî dev ji endambûn di vê saziya terorîstî de berdan, lê niha, vê saziya terorîstî bixwe di daxuyaniyekê de ku ji aliyê Hewza berevanîkirin a Pasdar Muhubî ya li bajarê Nodşe, ku di torên civakî de belav kiriye, daxwaz ji welatîyan kiriye da ku dîsan tevî vê saziya terorîstî bin.

Saziya Spaha Pasdaran a terorîst, saziyeye serberedaiye, û di devedrên sînorî



de, bi awayekî berdeyam, bi desteserkerina ciwanên Kurd, awartekirine bajarê Kurdistanê, û şevtandina dariştanên herêmên Kurdistanê, dest bi azar û ezyetkirina welatîyên Kurd dide.

Herwisa di heyamên derbazbûyî de jî, Spaha Pasdarana terorîst a rejîma Îranê, di xwendîngihan de jî, dest bi vergirtina zarokên dersxwen, wekî endamên wê siyaza terorîstî kirbû.

Her di vê pêwendiyê de, saziya Saspaha Pasdaran a terorîst bo dersxwenên ku tevî vê saziya terorîstî nebin, di paşerojê de, bo derfatên karê îdarî û herwisa çûna bo zanîngihan, astengiyan diafirînin û bi sedemên coda pêşî ji van digirin.

Ev kiriyara vê saziya terorîstî di demekê de ye ku, li gorî Yasaya navdewletî, zarokên jê temenê 18 salî, nabe tevî tu saziyeye çekdarî bin.

Rejîma Îranê di fêlbaziyên xwe de serneket



N: Kêyhan Mihemednijad

Bernameyên navkî ên Îranê di sala 1329'an (1950'i) de dest pê kir, û Îranê li sala 1353'an (1974'an) bo yekem car avakirina Saziya Enerjiya Navkî wajo kir, û bi çêkirina wixaneya navkî a Bûşehrê regekî nû bi xwe ve girt. Îran li sala 1337'an (1958'an) bû endamê Ajansa Navneteweyî a Enerjiya Navkî, û di sala 1347'an (1968'an) peyman çênekirina bedela çekên navkî (NPT) wajokir, û piştî derbasbûna 2 salan bi ser wê piroseyê, ew yek di Meclîsa Şevra Neteweyî de hate pejirandin.

Piştî herifina rejîma Pehlewî û bideştvegirtina deshilatê ji aliyê Xomêynî ve

Dema ku Mihemed Xatemî Serkomarê rejîma Îranê hate serkar, di rêkevtî 20'ê Rêbendana 1381'an (9'ê şibat 2003'an), Serkomarê rejîma Îranê Xatemî nûçeya dabîn kirina şevata navkî bo wixaneyên navkî ji aliyê pisporên Îranî ve ragihand, û piştî derbasbûna çend salan bi ser vê piroseyê û dema ku Mehmûd Ehmêdînijad wekî, serkomar piştî Mihemed Xatemî hate hilbijartin, di Xakelêweya 1385'an (Adara 2006'an) Mehmûd Ehmêdînijad ragihand ku, Îran serkevtî bûye û kariye bi qasî %3.5 uraniyûmê bimêhîne, û herwisa heya sala 1390'an (2012'an) berdewam bû.

Bi weşandina nûçeyan di wî warî de, valahiyeke bê mînak kete navbera Îran û Saziya Enerjiya Navkî de. Di encamê de, baykutên giran li dijî rejîma Îranê ji aliyê NY, Amerîka, Yekîtiya Ewropayê,

û welatên din yê cîhanê ve hatin pejirandin, û herwisa hin pisporên biyavê enerjiya navkî yê rejîma Îranê jî raştî tehrîman hatin.

herwisa girûpa 5+1 ku pêkhatibû li welatên wekî: "Amerîka, Russiya, China, Biritania û Firansa"yê, ku çendîn caran li çendîn welatan danûstandin di gel berpîrsên rejîma Îranê lidar xistibûn, di encamê de, piştî çendîn caran lidarxistina danûstandinan, gihîştin lihevkerina bi navê "Bercam"ê, û bi çendîn car demdirêjîkirina wê lihevkerinê, di encamê de li 27'ê Befranbara 1394'an (Kanuna Duyem a 2016'an) bo cara dawî hate vajokirin, ku ew lihevkerina di dema Serkomariya "Barack Obama" de bû, ku wî demê navbirî serkomarê Amerîkayê bû.

Rejîma Îranê bi fêlên û hîleyên xwe welatên Amerîka û Rojavayê her carê bi awayekî dixapandin, û bi vî awayî ku bi dizî ve mijûlî çêkirina bomba navkî bû, û herwisa bo êminiya welatê xwe alozî di deverê de diafirand, û dest li kiryarên têkderane û terorîstî ên xwe ber nedida û her cihekî aloziyek heba destê qirêj yê berpîrsên rejîma Îranê jî têde berçav diket, li ser encamdana wan kiryarên xwe yê terorîstî berdewam bû, heya ku "Donald Trump" di roja 20'ê Çileyê Paşîn 2107'an de wekî sekomarê Amerîkayê hate hilbijartin.

"Trump" serkomarê Amerîkayê, bi boneya 100 mîn roja serkomariya xwe, di nav koma alîgirên xwe de, lihevkerina navkî ya binavê "Bercam"ê ya di gel Îranê rexne kir û navbirî ragehand ku her çi li dijî berjewendiyên Amerîkayê be, emê ji nav bibin, herwisa navbirî bas ji dewleta "Obama" jî kir, û ragihand ku Dewleta "Obama" mîrateke gellek tevlihev û bêserûber lipey xwe bi cih hêlaye. Ew gefên serkomarê Amerîkayê li



dijî rejîma Îranê her berdewam bûn da ku, li roja 8'ê Gulana 2018'an, Amerîka bi fermî li wê lihevkerina bi navê "Bercam"ê vekîşîya û "Trump" ew lihevkerina wajo kir, û Amerîka dorpêçên aborî li dijî rejîma Îranê berdewam kirin û gellek kompanî û berpîrsên rejîmê jî tehrîm kirin, herwisa li 8'ê Nîsan 2019'an, "Donald Trump" serkomarê Amerîkayê, di daxuyaniyekê de bi awayekî fermî Spaha Pasdaran a terorîstî ya rejîma Îranê, xiste nav rêzbenda reş a saziyên terorîstî, û ev yekem car e ku Amerîka navendeke leşkerî a welatekê wekî girûpeke terorîstî dide naskirin.

Rejîma Îran û Spaha Pasdaran a terorîstî gef li hêz û berpîrsên Amerîkayê di deverê de dixwarin, û gefên berpîrsê payebilind ên rejîma Îranê her berdewam bû da ku, Amerîkayê biryar da ku, Gemiyên xwe yê balafirhîgir û bomavêjên xwe bo Kendavê veguhaze. Herwisa "John Bolton" 15'ê Banemera 1398'an ragehand ku, Amerîka gemiya balafirhîgir bo Rojhilata Navîn dişîne, û berpîrsên leşkerî û berpîrsên payebilind ên Rejîma Îranê bêdeng nediman, berdewam gef li Amerîkayê dixwirin û bo êrîşkirina li ser hêzên Amerîkayê yê di deverê de pîlan dadirêtin.

Her di vê derheqê de, Bêhroz Kemalwend, Berdevkê Saziya Enerjiya Navkî a rejîma

Îranê, di roja Duşemî 30'ê Banemera 1398'an (20'ê Gulana 2019'an) de, da zanîn ku, me uraniyûma mehandinî 3.67% ji, Çar hember zêde kiriye.

Niha êdî ajans û televîzyonên cîhanê, zêdetir basa wê yekê dikin, ka kengê şer û pevçûn di navbera wan herdu dewletan de bê gorê, dewleta ku xwediyê hêza cîhanî ye û serperestîya hemû cîhanê dike, û rejîmek jî ku bi kiryarên xwe yê terorîstî hemû cîhan tevlihev kiriye, û li her cihekê kiryareke terorîstî rû bide destên wê rejîmê tê de xuya ye. Rejîma Îranê her fêlek ku hebû ceriband, êdî ne fêl mane bikar bîne ne jî dikare li hemberî welatek ku serperestîya hemû cîhanê dike şer bike.

Rejîma Îranê dixwaze ji rêyên Saziya Enerjiya Navkî yê girêdayî xwe di gel Amerîkayê şerê bedel bike. Lê, ne li nav axa xwe de, û ew axa ku bi zorê zevt kiriye, belkû dixwaze li derveyî sînorên Îranê şer bike, û bi kiryarên terorîstî derbeyên giran li Amerîkayê bixîne, ku Amerîka mijûlê wan derbane be, da ku bikare fêleke din bibîne. Êdî Îran jî nikare bi fêlan Amerîkayê bixapîne, rejîmek ku bingeha wê li ser fêlbazî, dizî, binpêkirina mafê mirov û qirkirina neteweyên din hatibe avakirin, em dikarin bêjin rejîmek ku li ser dîvarê bê xîm hatiye avakirin êdî hema hêdî hêdî vê biherife.

Dîroka xwekujiyê li Kurdistan, Îran û cîhanê



N: Eskender Ce'iferî

Di demên dawiyê de rêjeya xwekujiyê li Kurdistanê Rojhilat berfireh bûye û li gor ku çalakvanên sivil didin xuyakirin, rêjeya salane a xwekujiyê li wir ne kêmîrî rêjeya salane a darvekirinê ye.

Xwekujî, kiryarê e ku mirov bixwe tê de biryarê dide dawiyê li jiyana xwe bîne. Mirov dikare bêje sedema sereke a vê kiryarê di nav hemû civakan de bêhêvîbûn e. Xwekujî, ji her çandekê bi her zimanekî û ji her neteweyekê be, digihe asteke ku li gor wî/wê neman jê re bi mifahtir e ji jiyane. Li gora zanyariyên ji çalakvanên Kurd, piraniya wan xwekujîyan ji ber sedemên weke aborî, tûşbûna bi madeyên hişber û ji ber pirsgerêkên nava malbatan e. Herwisa nebûna piştgiriyên aliyên hikûmî ji bo nexweşan jî, sedemeke din a xwekujiyê ye.

Bi rengekî ku kesê nexweş, kesekî li derdora xwe nabîne û ji ber nebûna piştevanan, yan tûşî nexweşiyê giran weke Skîzofêrnî tê, yan jî dawiyê li jiyana xwe tîne. Eger bîmeyek tine be ku li pişt kesê nexweş bisekine, nexweş jî nikare pişt xwe bi kesî gerim bike.

Li gor bendên cuda ên yasayên parêzvanên mafên mirovan, pêwîst e hikûmet ji bo kesên ku bêkar in yan jî derfeta çareseriyê tendirustiyê bi îmkanatên xwe nîn e bîmeyan dabîn bike û xerxa tendirustiyê û jiyane ji bo wan bê mezaxtin.

Eger kerameta mirovan ji hikûmetan re girîngtir be, divê kesekî sivil nekare bi

hêsanî çek û sîlahan bi dest bixîne. Hebûna çek û sîlahan di civakê de dikare fikra tundajo li pey xwe ve bîne. Eger salane 500 welatîyên Kurd ji aliyê wezaretê Dadê a Komara Îslamî a Îranê ve tenê darvekirin yan jî di dema kolberiyê de tîn kuştin, zêdetirî 500 kesên jî dawiyê li jiyana xwe tînin.

Hebûna hebên naskirî bi Birinc û Siyanor jî dikare rê li ber xwekujiyê veke. Ew kîjan dermangeh e ku li Îranê, bêy biryara bijîşkan, heban nefiroşe! Salane 800 hezar kes heta milyonek kesên li hemû cîhanê bi şewazên curbicur dawiyê li jiyana xwe tînin.

Rêkar û rênimûniyên ayînî, dema ku tevî siyasê dibin, fikra mirovan jî diguherin. Li gor ola Îbrahîm, jiyana tiştê pîroz e lê xwekujiyê jî gelek mezmûm nîn e. Japonî jî xwekujiyê weke qerebûya pêşîneya xirab dibînin. Li Hindîstanê jî jina ku zilamê wê dimir, dikarî xwe bavêje ser agirê ku laşê zilamê pê dişewtînin û ew jî dawiyê li jiyana xwe bîne.

Perwerdekirina zarokan li gor fikrên qedîm jî dikare sedemeke din a xwekujiyê be. Hin ji wan kesên ku bi vî rengî tene perwerdekirin, rastî girûpên tundajo tîn û xwe di berjewendiya wan de dikujin. Lê li Kurdistanê Rojhilat asta bilnd a xwekujîya ji ber sedemên siyasî û aborî, vê şewaza xwekujiyê vedîşere.

Li gelek ji welatên Rojava, êdî xwekujî yan hewla xwekujiyê weke tawan nayê hejmarkirin. Lê belê divê ji bîr nekin ku asta jiyana xelkê li welatên Rojava eger gelek jî baş nebe, lê hêjayî kerameta mirovan e.

Li hin welatan şewazeke xwekujiyê bi navê Xwekujîya Alîkar heye. Hin çalakvan dibêjin hikûmeta Îranê jî bi kiryarên xwe ên aborî û siyasî bûye alîkara xwekujîyê ji



bo qurbanîyên wê. Êdî li hin welatan şewirmendên xwekujiyê jî hene ku hêsantirîn rê jî bo xwekujiyê nîşanî xelkê didin. Lê belê bi ti awayekî mirov nikare Îranê û Kurdistanê Rojhilat bi welatên Rojava re danî ber hev. Nirxandina civakê bi civakên din re, tenê di demekê de çê dibe ku asta jiyana welatîyên wan jî weke hev be. Hin siyasîyên Îranê pêşniyar dikin ku ew kesên xwekujiyê dikin, ji merasîma veşartina term di qebriştanên gund û bajaran de bêne bîparkirin. Lê belê wan jî bîr kiriye ku divê çavkaniya xwekujiyê bê hişkkirin. Mentiqa wan kesan Atêna berê a Yonîstanê ye ku kesên bêy erêkirina hikûmetê dawiyê li jiyana xwe tînin, ji binaxkirina di goriştanan de tene bîparkirin û bê navûnîşan li dervey goriştanan tene binaxkirin.

Dibe ku ew kiryar jî bîkarin meyl û heza xelkê ji bo xwekujiyê kêmkirin. Lê disa jî nabe hikûmet ewqasî xemsar be ku li dewsa zuhakirina çavkaniyê, qurbanîyan weke tawanbar binav bike yan jî piştî xwekujiyê, hikûmet dest danî ser milk û malên wan. Desthilata ku herî zêde bi şeweyek radîkal li hemberî vî mijarê derdiket, Berîtanya di sedsalên 19'an de bû. Eger

li ser kesekî/ê bihata îsbatkirin ku hewla xwekujiyê daye, ew kes dihate darvekirin.

Mentiqa wan desthilatan ji bo îdamkirina kesên ku dest davêjin xwekujiyê ew bû ku tîrsek li cem xelkê çê be û li encama xwekujiyê bifikirin. Ji xeynî sedemên han, hin bûyerên din jî çê dibin. Çendin caran heta niha li Kurdistanê Rojhilat bûyerên bi vî rengî derketine ku keçek ji aliyê sazîyên ewlehî ve tê girtin. Tê gotin ku hêzên navbirî di girtîgehan de destdirêjîyê dikin ser wan keçan ku bi sedemên siyasî hatine girtin. Ji ber vî jî, hin keçên Kurd piştî ku serbest tene berdan, dawiyê li jiyana xwe tînin da ku navekî xirab nekeve ser wan. Hin siyasîyên nêzîkî Mihemedê Xatêmî li Îranê behsa yasayîkirina xwekujiyê kiribûn. Lê berî ku bibe mijara ragihandinê, hate bîdengkirin. Li gor wan kesan, diviyabû kesên ku dixwazin dawiyê li jiyana xwe bînin, sedemên baş ji bo vî biryarê bînin û endamên laşê xwe jî pêşkêş bikin.

Li Amerîkayê ji salan 2008'an ve li 16 navçeyan derfeta xwekujiyê bi şeweyekî fermî heye û belkî çavên reformxwazên Îranê jî li Amerîkayê bin.

28 sal di ser wefeta Ahmed Arîf re derbas bûn

Ahmed Arîf 2ê Hezîrana 1991ê li Enqereyê çû ber dilovaniya xwedê

2ê Hezîranê 28emîn salvegera wefata hostayê helbestan Ahmed Arîf e. 33 Gulle, Min Ji Hesreta Te Qeyd Kevnarkirin, Behar Hatiye Çiyayên Welatê Min û Oy Hawar çar helbestên navdar ên Ahmed Arîf in. Ahmed Arîf di berhemên xwe de şewazê polîtîk bikardianî û helbestên wî ji aliyê gelek hunermendên navdar ve bûne stran.

Navê Ahmed Arîf ê raşt Ahmed Onal e. 21ê Nîsana 1927ê li Amedê ji dayîk bûye. Zaroktiya wî li Amedê û Sêwrekê derbas dibe. Li Sêwrekê dibiştana seretayî diqedîne. Li Rihayê dest bi dibiştana navendî dibe û li Afyonê tamam dibe. Piştî, li Fakulteya Ziman, Dîrok û Erdnasyê ya Zanîngeha

Enqerê, li Beşa Felsefeyê dest bi xwendinê dibe lê ji ber girtinan xwendina xwe naqedîne.

Ahmed Arîf di salên 1950 û 52an de du caran tê girtin û 2 salan di girtîgehê de dimîne. Ji ber wê helbesta xwe ya bi navê "33 Gulle" ya li ser "Komkujiya Muglali" ku di sala 1943an de li Wanê 32 tîn kuştin yek kes jî birîndar dibe bi dehan caran tê binçavkirin û rûbirûyê îşkencayan dibe. Ahmed Arîf di helbesta xwe de dibêje:

Mêrxasî nayê înkarkirin

Ji hezar salan vir de, kurên vê dere

Di şerê yeko-yek de tîk neçûn

Were, em ji ku xeberê bidin

Ev ne refê qulingan e

Di asîmanan de

koma stêrkan nîn e

Dilê bi sî û sê gule

Sî û sê kaniyên xwîne

Naherike,

Bûye gol li vî çiyayî



Ji ber helbestên xwe gelek caran tê girtin û îşkencekirin. Helbestên wî di navbera salên 1944-1955an de di kovarên wê demê de tîn weşandin. Pirtûka wî ya navdar, bi navê Min Ji Hesreta Te Qeyd Kevnar Kirin sala 1968ê bo cara yekê tê weşandin, ew pirtûk heta niha nêzikî çil caran hatiye çapkirin û çend kesan jî wergerandine zimanê Kurdî.

Ahmed Arîf 2ê Hezîrana 1991ê li Enqereyê çû ber dilovaniya xwedê. Piştî wefata wî hinek helbestên wî ên ku berê di kovaran da hatibûn weşandin bi keda Filinta Önalê kurê Ahmed Arîf hatin berhevkirin û sala 2003ê bi navê Welatê Min Şahdamarê Min hat weşandin. Ahmed Arîf her çiqas helbestên xwe bi Tirkî nivisîbin jî, le ne şaş e ku bê gotin helbestên wî ji aliyê hûnandin û naverokê ve ji Tirkî zêdetir nêzikî Kurdî ne. Rûdaw

Hûnermend Adîk 75 salan di xizmeta kultûra Kurdî de bû

Îro 12.mîn salroja koça dawiyê ya hûnermend û tembûrvanê çiyayê Kurmanc Adîk e. Adîk temenekî dirêj zêdetir ji 75 salan di xizmeta kultûra Kurdî de derbas kir û bi emanet bo nîşên nû veguhas.

Tembûrvan Adîk sala 1907`an li gundê Îska ya navçeya Şêrewa ji malbateke Kurd a Êzidî jidayîk bû. Di Adîk deştêkê de bo heyama 30 salî li gundê Îska, Celemê û Mile Xelîla ma û piştî li gundê Korayê ya ser bi navçeya Cindirêsê bicih bû.

Adîk ji biçûkatîya xwe karê darteraşiyê kir û tembûr jî çê dikirin û li ser deştê tembûrvan Hûsê Xel fêrî tembûrê bû û ji dengbêjên wek Hêmuşê Kûrik, Îbramê Tirko fêrî stranên bû. Adîk ji sala 1930`î heya dema koça dawiyê, di 1`ê Hezîrana 2007`an bi dehan şevbuhêrkên mûzîkî û stranên dengbêjiyê bi hûnermend û dengbêjên wek

Cemîl Horo, Reşîdê Mem Çûçanê, Omerê Cemlo, Mihemed Elî Tico, Bavê Selah û gelek dengbêjên Çiyayê Kurmanc re lidar xistin.

Cudahiya Adîk ji hemû hûnermend û tembûrvanên ew bû, wî li tembûra 16 perdeyî dide û tenê bi tiliyan lê dida û wek behretirîn şarezatirîn tembûrvanên herêmê dihat naskirin, bi taybet di meqam û stranên Kurdî yê kevnan e.

Hûnermend Adîk di jiyana xwe de jî beşdarî gelek mehrîcan û feştîvalên hûnerî li Efrîn û Helebê bû, û di sala 2000`an de beşdarî mehrîcaneke hûnerî li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê bû û di wê mehrîcanê de xelateke rêzîlgirtinê ji ber karê xwe yê hunerî de wergirt.

Ji stran û miqamên ku Adîk lê didan û gelek hûnermendên jê werdigirin, stranên wek Eysa Îbê, Xarzî Mihemed, Tayîr beg, Siyamendê



Silêvî, Derwîşê Ebdî û bi dehan stran û miqamên din ên kelepûrî bûn.

Di sala 2006`an de jî koma Armanc û her du hûnermendên Efrînê Bavê Selah û Rêber Armanc li Efrînê ahengeke taybet bo Hûnermend Adîk kir û tê de ew xelat kir. di vê derbarê de Hûnermendê Efrînî Rêber Armanc ku di dawîya temenê wî de pêwendî bi Apê Adîkê re dikir gotiye: Apê Adîk nimûneya hûnermend û tem-

bûrvanên Çiyayê Efrînê bû, zêdetir ji 75 salan ji temenê xwe di xizmeta hûner û kelepûra Kurdî de qedand û bandoreke wî ya mezin li ser nîşên di dû re bû û cihekî wî yê taybet li cem xelkê Efrînê hebû.

Hûnermend Adîk di 1`ê Hezîrana 2007`an de koça dawiyê kir û bi beşdariya bi hezaran xelkê Efrînê, hezkiriyên wî, komên filuklorî li goristana gundê Kora bi axê hat spartin. Rûdaw

Zimanê Kurdî

Pirraniya şarezayên zimanê kurdî (KJ) jimara cînavên nîşandan dikin (8) cînav . Ew jî ev in : 1- Ev : Bo destnîşankirina navên nêz, yên yekjimar û

komjimara her dû zayendan (nêr û mê), di dem

û raweya rasteder (bê tewandin) de.

Wek :

- Ev mêr mêvanê kê ye ?

-Ev mêr mêvanên kê ne ? - Ev jin ji kû ye ?

-Ev jin ji kû ne ?

2- Ew : Bo destnîşankirina navên dûr, yên yekjimar û

komjimara her dû zayendan (nêr û mê) di dem û raweya rasteder de.

Wek :

- Ew hespê ha, yê kê ye ?

- Ew hespên ha, yên kê ne ?

- Ew mehîna girêdayî, ya kê ye ?

- Ew mehînen girêdayî, yên kê ne ?

3- Vî (evî) : bo destnîşankirina navên nêz, yên

yekjimarên nêrza, di raweya verêsê (tewangê)de

Wek :

- Ez vî (evî) mirovî dinasim.

- Vî hespî bibe ser avê.

- Li ber siya vî dîwarî rûne .

4- Vê (evê) : Bo destnîşankirina navên mêzayên

yekjimar, ên nêz, di raweya verêsê de .

Wek :

- Ez vê jinê dinasim .

- Vê mehîne bibin ser avê . - Berên vê darê xweş in .

5- Van (evan) : Bo destnîşankirina navên nêz, yên

komjimara her dû zayendan, di raweya verêsê de.

Wek :

- Tu van mêran dinasî ?

- Malên van keçan li kû ne ?

- Van hesp û mehînan bikirrin

- Van dar û beran bibin hêlekê .

6- Wî (ewî) : Bo destnîşankirina navên dûr, yên

nêrzayên yekjimar di raweya verêsê de .

Wek :

- Tu wî hevalî dinasî ?

- Wî hespî bibe mêrgê . - Ez ê wî xaniyê bifroşim .

7- Wê (ewê) :Bo destnîşankirina navên dûr, yên

mêzayên yekjimar di raweya verêsê de .

Wek :

- Mala wê keçê li kû ye ?

- Wê mehîne bibe mêrgê . - Kulîkên wê darê diweşin .

8- Wan (ewan) : Bo destnîşankirina navên dûr, yên

komjimara her dû zayendan di raweya verêsê de .

Wek :

- Em wan mêrxasan ji bîr nakin .

- Rêz û rûmetê bidin wan dayikan . - Wan hesp û mehînan em bikin .

- Wan dar û beran bidin hêlekê .

Bi dîtina min cînavên nîşandan (2) cînav tenê ne. Ew jî ev in : -

Ev : Bo destnîşankirina navên nêz, yên yekjimar û

komjimara her dû zayendan bikar tê.

-Ew : Bo destnîşankirina navên dûr, yên yekjimar û

komjimara her dû zayendan bikar tê.

Helbet, ev her dû cînav jî di dem û raweya rasteder (bê verês)

de bikar tên. Lê dema ku ev cînav dikevin raweya verêsê,

hingê nîşandekên verêsê (î, ê, an) dighêjin wan û bi vî rengî

têne guherîn :

1- Ev + î = Evî : - Evî hespî bibe mêrgê .

- Ev + ê = evê :

- Evê mehîne bibe mêrgê .

- Ev + an = evan :

- Evan hesp û mehînan bibe mêrgê .

Dom heye...

Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdiştanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 -FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (351)

Rejîma Îranê di Kurdiştan de bi berdewamî cinayetên diafirîne



Yek ji wan cinayetên ku rejîma Îranê di Kurdiştan de afirandiye, û wekî lekeyeke reş li ser eniya wê rejîmê xuya ye, bidarvekirina 59 ciwanên Mehabadê bû.

Li sala 1362`an, du salan piştî encamdana cinayeta kuştina bikom li gundê "Qarnê", li sala 1362`an, rejîma cinayetkar a axundên Îranê, bi bê hebûna tu belgeyêke yasayî û tenê bi armanca tolstandin û kerbvebûn li civaka Kurdiştanê û neteweya Kurd, 59 ciwanên Kurd ên bajarê Mehabadê bi tohmata alîkarîkirina di gel PDKÎ, li bajarê Tevrêzê bidarve kirin.

Destûra desteserkirin û bidarvekirina wan 59 ciwanên Kurd yê li bajarê Mehabadê, ji aliyê "Hemîd Celayîpûr" Fermandarê wê serdemê yê rejîmê, li bajarê Mehabadê hatibû dan, û bi bê hebûna tu belgeyêke yasayî, ew cezayê dijîmirovî derkiribû, û dana wê cezaya dijîmirovî di demekê de bûye ku

hejamrek ji wan girti-

yan zarok bûne. Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, di wê serdemê de, tevî şermezarkirina wê kiryara dijîmirovî, û di tolstandinê wê cinayetê de, li bajarê Kurdiştanê, nemaze li nêzikî bajarê Kirmaşan, Kamiyaran û Sineyê, 59 êrişên serkevtî li dijî dagirkarên Kurdiştanê encam dan, ku fermandehiya wan êrişan li stûyê şehîd "Şapûr Fîrûzî" bû.

Kesayetiyekî naskirî li bajarê Urmiyê çû ber dilovaniya xwe

Kesayetiyê naskirî Kyê bi navê "Dr. Nasir Qasimlo" bi sedema sekinîna dil çû ber dilovaniya xwe.

Roja Yekşemî 12`ê Cozerdana 1398`an (2`ê Hezîrana 2019`an) "Dr. Nasir Qasimlo" kurê "Dr. Elî Qasimlo" di temenê 60 saliyê de, çû ber dilovaniya xwe. "Dr.

Nasir" birazayê şehîd "Dr. Ebdulrehman Qasimlo" bû, û xwediyê bawerînameya dukuraya çêkirina dermanan bû, û herwisa kesayetiyê hezkirî û cihê bawerîya gelê Kurd li bajarê Urmiyê bû.

Xwedêjêrazî hertim şanazî bi vê yekê dikir ku, ser bi mal-



bata nîştimanperwer a Qasimlo û biraziyê şehîd "Dr. Ebdulrehman Qasimlo" ye.

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, sersaxiyê dibêje malbata mezin a Qasimlo, û xizm û kesûkarên xwedêjêrazî, û xwe şîrîkê vê xema wan dizane.

Kovareke Amerîkayî: Kurd di şerê Amerîka û Îranê de wê roleke yekalîker hebe

Kovara Amerîkayî, Kyê bi navê "National Interest", di raporeke xwe de derheq şerê di navbera Amerîka û Îranê de dibêje, Kurdan wê roleke yekalîker hebe.

Aloziyên di navbera Amerîka û Îranê, rû li zêdebûnê ye û herdu alî gefên tund li hevdu dixwin, û hêzên xwe bo rûbirûbûna li hemberî hevdu amade dikin, her yek ji wan dixwazin desthilat û hikûmetên deverê bo aliyên xwe rabikêşin.



Wekî hemû arîşeyên din ku, li çend dehikên borî di Rojhilata Navîn de çê bûne, Kurd roleke berçav hebûye, û hevdem tevlî alozî û arîşeyan bûye, û beşa Kurdiştana bindest ya Îraqê, piştî şerê yekem ê kendavê bi piştevaniya Amerîka û welatên Rojavayî, cureyek ji xwebirêveberî û

pêşkevtinê bi xwe ve ditiye.

Hekî şerê raşterast di navbera Amerîka û Îranê de çê bibe, bê guman Kurd dixwaze mifahê ji rewşê werbigire, û bo berjewendiyên xwe pêngavan biavêje, çimkî di 100 salên derbazbûyî de, beşeke Kurdiştanê xîstine ser Îranê, û hevdem rejîma Îranê jî berpirsiyar e li hemberî kuştina bi hezaran xortên Kurd.

Ev rapora, derheq Kurdên Rojhilata Kurdiştanê nivîsiye: Derfeteke baş ji bo wan tê pêş, ku bigihîjin xwebirêveberî û serbixweyiya xwe, yan jî bigihîjin encamekê ku di Başûrê Kurdiştanê de çê bûye.

Herwisa bas ji vê yekê jî dike ku, di vê navberê de rola Kurd bi tevahî mezin e, û yekalî dibe, û Kurd dibe bi avakerê desthilata paşerojê di Îranê de.